

# Em Pîng Pong'ê bi Unikum'ê diguherin

Vê havînê, Bildningsförvaltningen (Rêveberiya Perwerdehiyê) dê Lärplattformen Pîng Pong (Platforma Fêrbûnê Ping Pong'ê) biguhere. Navê Platforma Hînbûnê ya nû Unikum e. Em hêvî dikin ku ev guhertin baş derbas bibe, spas ji bo sebra we!

## Çima em Lärplattform'ê diguherin?

Em ketin îhaleyekê û Unikum qezenc kir. Unikum bêhtir fonksiyonên wê hene û di jiyana rojane ya pedagogîkî de ji bo xwendekar û mamosteyan piştgiriyêke baştir e..

## Kengî Pîng Pong dê winda bibe?

Di **1ê Tîrmehê** de, Ping Pong winda dibe. Li se rmalpera [katrineholm.se/unikum](https://katrineholm.se/unikum) Li [katrineholm.se/unikum](https://katrineholm.se/unikum) hûn ê li ser karê guhertina Unikum agahdarî hene. Ji ber vê yekê, çavê xwe hinekî zêde li ser rûpelê bigerînin, da ku hûn agahdariya girîng a derbarêyê guherînê ji dest nedin.

## Kengê mirov dikare têkeve malpera Unikum'ê?

Di 9ê Tebaxê de hûn dikarin bi riya Lärknuten xwe bigihînin Unikum'ê û bi e-legitimation (e-nasname) têkevin nav sepanê (malperê). Ji sepanê re Unikum familie tê gotin û hûn dikarin wê ji ser [App Store](#) yan [Google Play](#) daxînin

## Ma ez dikarim çi li Unikum'ê bikim?

Di Unikum'ê de hûn ê li nav gelek tiştên din bikaribin van tiştan jî bikin:

- ji pêşdibistan/dibistanê agahdariyê bigirin
- ji perwerdekarên zarokê xwe agahî bistînin
- bi mamosteyên zarokê xwe re têkilî daynin
- pêşveçûna zarokê xwe bibînin
- kar û bernameya zarokê xwe bibînin (dibistan)
- bersiva vexwendinên axaftinên geşedanê (Utvecklingssamtal) bidin
- ji Bildningsförvaltningen'ê (rêveberiya perwerdehiyê) agahdariyê bigirin

## **Ma ez li ku derê dikarin bersivên pirsên xwe bistînim?**

Heger derbareyê Unikum'ê de pirsên we hebin, an jî heger tiştek xelet here, hûn dikarin bi riya [larknuten@katrineholm.se](mailto:larknuten@katrineholm.se) bi Lärknutensupport'ê re têkilî bikin.

Unikum ji bo we weliyên zarokan fîlm çêkiriye. Hûn dikarin van fîlman li ser [Unikums webbplats](#) (malpera Unikum'ê) bibînin.